zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

## KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Sal: 1985


Hejmar: 23


www.arsivakurdi.org





ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

# A L Î


bakur
rohilat
roava
başûr


bakur
roavayî bakur
rohilatî bakur
roava
rohilat
roavayî başûr
rohilatî başûr
başûr




www.arsivakurdi.org

# K U L Î L K

Ez kulîlk im kulîlk im
Ez kulîlka Kurda me

Kovara şagirta me
Diyarî zaroka me

Ez kulîlk im kulîlk im
Ez kulîlka kurda me

Ez kulîlka xwendinê
Rêça nivîsandinê

Ez kulîlk im kulîlk im
Ez kulîlka kurda me

Bona xwe naskirinê
Kurdino guh bidinê

Ez kulîlk im kulîlk im
Ez kulîlka kurda me




DURUST/Kurdistan


## HEZJÊKIRNA HEVALAN

Şev û roja min tuyî li bîra min
Te ji bîr nakim tu delala min
  Carek bipirse li vî halê min
  Ruh çû hêlekê wer ser canê min
Bi şev dinalim bi roj xem xwar im
Ez dikim nakim bi dil nikarim
  Ji eşqa evînê ez hêvîdar im
  Yek roj nebînim dil bi brînim
Dêmê sorgulî çavên kilkirî
Di xewna min de di ber min buhurî
  Şiyar bûm ku wê aqlê min birî
  Ez li pê wê çûm lê min ew nedî
Li çol û çiya ez pir geriyam
Min ne perî dî ne vegeriyam
  Ji kê dipirsim ew hur û nazî
  Ji min re dibêjin wek teyrê bazî
Li seyd û nêçîrê tiwê bibezî
Belkî carekê li te bike gazî
  Tu İzzedînî tu ne pir dînî
  Tu sebra xwedê carek bikşînî
  Dilê guhdaran tu neêşînî
Silav li ser we koma hevala
Pey vê min gotin ne şerm û ara

İZZEDİN

Kurdek ji bakurî Kurdistanê
ku li Saûdî Arabîstanê dixe-
bite.

# MİJÛLÎ





Gelo ev pêşmerge riya xelasiyê di kîjan riyê de dibîne? Daye ser kîjan riya rast ?

www.arsivakurdi.org


# DEMSAL(Mewsîm)


Dinya(Gerdûn) di atmosferê de li dora royê digere.Vê gerê di salekê de temam dike.Çaxa dinya li dora royê digere û gera xwe ya salê dike,tîrêjêr royê carna sererast û carna bi meyil tên ser.Tîrêjên ku sererast tên ser dinê germ in,germitiya wan pir e.Ji vê yekê di pê-vajoka salekê de hewa;geh germ,geh sar û geh jî sarûgerm dibe û demsal tên meydanê.




Di welatê me Kurdistanê de çar demsal hene. Ev bi gelemperî li her cihî jî wilo ye,ev şertekî tebîetê ye.

1-BUHAR 2-HAVÎN 3- PAYÎZ 4-ZIVISTAN(ÇÊLE)





Havînî roj dirêj in
Ro bi dirêjayiya seetan li asîman dimîne.
Tîrêjên xwe yên germ bera ser dinê dide.
Havînî dinya gelekî germ dibe

zivistanê roj kin in
Ro bi dirêjayî li asîman namîne û zî diçe ava.Ji ber ku zivistanê tîrêjên royê bi meyil tên ser dinê,hewa pir sar dibe.



www.arsivakurdi.org



JI ZAROKÊN DINÊ



# SERPÊHATÎ

Li bajarê Berlînê(bajarekî Almanya ye) zarok diçin dibistanekê.Ji her rengî û ji her miletî zarok di wê dibistanê de hene û tev bi hev re dixwînin.

Rojekê mamostekî nû tê sinifê û ji şagirtekî Tirk dipirse:

-Kurê min tu çiyî?

Şagirtê Tirk lê vedigerîne:

-Ez Tirk im mamoste!

Mamoste cardin jê dipirse:

-Ev çi gotine?Ez Tirk im!

Şagirt dibêje:

-Lê bavê min jî dibêje"ez Tirk im"

-Wekî din!

-Wele bavê min Tirk e lê diya min Alman e.

Mamoste îcar ji şagirtekî Kurd dipirse:

-Kurê min,başe tu çiyî ?

Şagirtê Kurd xwe bi ser hev de qilûz dike û bi stuxwarî bersivê dide:

-Ez..ez însan im mamoste

Mamoste bi vê gotina wî kêfxweş dibe


-Brawoo! Min te fêm kir,lê mixabin esl û peslê wiyê din hê ne kifş e.

ADIL DURAN/Berlîn

www.arsivakurdi.org

# HEWA Û BIJÛNDARIYA ME

Em jîna xwe bi hewa bi dest dixin,lê ev hewa divê hewa paqij be.Ger di hêwanekê an jî di saloneke teng de gelek meriv rûniştibin,hewa wê hêwanê paqijiya xwe wenda dike. Di ciyên ku karxane(febrîqe) tê de pir bin hewa paqij li wir kêm e.Ji ber ku karxane gaz û dûmanên cûrbecûr bera nava hewê dide û paqijiya hewê nahêle.Hewa ku ji bijûndariya me re pêwist e,hewa tebîetê ya paqij bi xwe ye.



Divê em wextê xwe yê vala,ne di hundur an jî di ciyên girtî de,lê belê li ciyên vekirî,bi gerê û bi sporê derbas bikin. Çaxa em demekê dirêj di hundur an jî di hêwanekê de bimînin,divê em car bi caran pencceran(şibakan)vekin û hewa paqij bera hundur bidin,da ku hewa ne paqij ji hundur derkeve û meriv pê nexweş nekeve.

Germiya hewê li gor demsalan tê guhertin, Ji vê yekê em jî li gor demsalan li xwe dikin û li gora demsalan xwe diparêzin.Ji bo ku germiya laşê meriv bê paraztin,divê em zivistana cilên stûr(qalind)û havînan jî cilên tenik li xwe kin.Lê di buharê de meriv li gora seetên rojê cilan(çek,kinc)li xwe dike.Ji ber ku di buharê de roj geh germ in û geh jî sar in.

Hin mîkrobên nexweşiyan bi çavan nayên dîtin,pir piçûk û pir sivik in.Ew karin tev li hewê bibin.Mîkrobê nexweşiyên"jana zirav (werem)zekem"û her wekî din,ji wan mîkroban in.Ev mîkrobana ji merivên nexweş bi riya pîşkînê,bi riya bêhnberdanê an jî bi riya kuxkê tevî hewê dibin,û ew bi bêhnstendinê derbasî merivên bijûndar(merivên saxlem) dibin.

Merivên bijûndar û li ser xwe,divê xwe ji merivên nexweş û ji ciyên bi toz biparêzin.Divê meriv tim der û dora xwe paqij bihêle.



# ÇÛKÊ PIÇÛK

MAKSÎM GORKÎ
sala 1912 nivîsiye



Cîhana çûkan weke ya însêne..Çûkên nêr û mê ê mezin deyn dikin li ser çi tiştên ku di pirtûkan de hatiye,lê çêlîkên wan jî ji mêjiyên xwe tiştan derdixin.

Hebû tune bû çûkekî piçûk hebû,navê wî "Budik" bû.Ew li ser pencera serşokê li paş pirwaza wêyî derve,di hêlîna germ û nerm de dijiya.Bûdik hê dest bi firê ne kiri bû.Wî baskên xwe tim dadiweşand û serê xwe ji hêlînê derdixist..bi dilşewatî dixwest ku cîhana xwedê nas bike û binere bê jê re dibe an na.

Diya Bûdik jê re got:

-Te go çi,te go çi

Baskên xwe dawşand û li erdê nerî û stira

-Re-reşe...reşe!

Bavê wî hat û hinek kurm jê re anî bûn û got:



www.arsivakurdi.org

-Ma ez ne jîr im

Dê jê re got:

-Tu jîr î..tu jîr î

Lê Bûdik ew kurmên han dixwarin û xwe bi xwe digot:

"Çima xwe pozbilind dibînin,her û wer kurmek bi ling dane min..!"

Û her wîna serê xwe ji hêlînê derdixist û keser berdidan.

Diya wî bi tirs jê re got:

-Lawkê min,lawkê min..ha ji xwe hebe tê bikevî.

Bûdik jê pirskir:

-Kuderê,kuderê ?

Bavê wî jê re da xwîya kirin û got:

-Tê bikevî ser erdê û wê pisîk te di nav lepê xwe de bide û wê bêje"hem.hem!

U bav firî çû nêçîrê

Jiyan bi vî awayî dimeşiya,lê belê baskên Bûdik hêdî hêdî mezin dibûn.

Derbekê bakî xurt rabû,Bûdik pirskir:

-Çiye,çiye?

Dê bi ronakî jê re got:

-Wê ba li te rabe..sû..sû..û wê te bavêje ser erdê..ji bo pisîk te bixwin.

Ev gotin neket serê çêlîkê piçûk.Bûdik got:

www.arsivakurdi.org

-Çima dar nahejin?ji bo bisekine,û dûre hew ba radibe...

Dê hewl dida ku wîna li ber xwe ku ne wisa ye,lê belê wî her wer nedikir...wî dixwest her tiştî li gora aqilê xwe bike.

Cotkarek di ber serşokê re derbas bû û çeplê xwe hilda

Bûdik got:

-Pisîkê baskên min jêkir..û tiştek nema ji hestî pêve

Diya Bûdik got:


-Ew însan e,her kes bê bask in!

-Çima?

-Ji adeta xwe de ew bê bask dijîn,ew bi lingên xwe dimeşin,tu tê gihiştî?

-Çima?

-Ji ber ku baskên wan hebana wê nêçîra me bikirana,çawa ku ez û bavê te jî diçin nêçîra kurman...



Bûdik got:
-Zeriye!Gotinên vala! Gerek baskên her kesî hebin.Belkî jiyan li ser erdê pîstir e,lê ezman!..Çaxa ez mezin bibim ezê bihêlim ku hemû bifirin.

Bûdik bawerî bi diya xwe ne tanî û nizanî bû ku heçê baweriya xwe bi diya xwe neyne wê yeka xwe bibîne.

Bûdik li ser kêleka(tihêla)hêlînê rûnişt û dest bi stranê kir û bi dengekî bilind helbestên xwe xwendin:

Hejare ev mirov
Diçe...bê bask
Û dimilmile bi laşekî qertelî
Lê belê wîna dixwin ew kurm
û ez piçûk im,tiştek ji destê min
nayê

Bûdik stra û stra,heta ku"terp"û ji hêlînê hate xwar.Diya wî pê ve bazda,Lê belam pisîka sor û çav kesk li benda vê yekê bû.

Bûdik tirsiya,baskên xwe rada û sekinî, lingên xwe yên şîrikî radan û ji pisîkê re got:
-Ez bi naskirina te pir kêfxweş dibim..ev şerefek mezin e ji bo min.

Diya wî ew bi alîkî de bir û periyê wêna gij(bel)bûn.Ew jî pir ditirsiya,û bi mêrxasî niklê xwe vekir,ber bi çavê pisîkê bir û kir qajwaj:

-Dûr keve,dûr keve!

Bûdik kir fir fir û frî xwe li ser pencerê danî,ji erdê bilind bû,baskên xwe hejand û li hev xist..hop..hop û xwe li ser kulekê danî

Diya wî jî yekser çû cem,bi dilekî pir geş tevî ku tirya xwe kir qurban,û li tenişt wî rûnişt(wêsiya),niklê xwe li pişta stuyê wî dixist û digot:

-Çima,çima?

Bûdik got:

-Pak e! tu nikarî yekser her tiştî fêr bibî,

Lê belê pisîk li ser erdê bû û wê qeremûş-kên lingên xwe paqij dikir û bi nerînek mixabinî li wan herdûka temaşe dikir(dinerî).

Bi vî awayî her tişt bi aşitî derbas bû,ku em çavên xwe ji teriya diya çûk bigrin,



1912.M.GORKÎ

Werger:FEYSEL XELEF

Mosko 1985

## DERDÊ WELAT

Hesenê surî navê min e
Ewrenê keftar neyarê min e
Kelha Mêrdînê warê min e
Xebata rastî armanca min e

Xebata min roj û şev e
Gazî û qîra min herdem jî ev e
Wê Kurdistan her bindest be
Heta neyar jê nereve

Ezim Hesenê surî ji partiya karkera
Warê min niha nema bûme mîna koçera
Guhê min ker bûn ji dijûn û xebera
Fermana min xwendin bajarê Ankara

Ez dikalim û dinalim ji brîna dilê xwe
Welat min te nedît rojekê li xewna xwe
Dijmin te dimiji bizor û zilma xwe
Ez li çola kerbela mame li halê xwe

Welat ma çima te ez bi kul kirim
Ji dîwanê carek ez mehkûm kirim
Ferzend,Rojhat,Eyşan û Cîhan te hêsîr kirin
Te ez li çola Ereba belengaz kirim

Hundurê min tijî bû hemû ji xwîna reş
Min ji bîr kirin hemû gotinên xweş
Welat,ez hişk bûm wek dara bê peş
Bayê welat li min da ez hiştim bê hiş
Gelo ezê te bibînim rojekê bi dilê geş

x x x x x x x x x x x x x x x x x x x x x

Gelî brayên delal û hêja
Heta mirinê ez di kul û meraqa we deme. Hesreta welat ez çiqas bêjim hindik e û bêhna min û hewesa min bêyî welat dernayê.Derd û kulên min,axîna dilê min welat e.


Brayê we

HESENÊ SURÎ/S.Arabîstan

## EV ÇI NE? ÇI DIKIN ?



........................




........................

........................



........................




........................



........................

........................

........................



........................

........................



........................

........................



........................

........................




........................

........................




www.arsivakurdi.org

SEET ÇEND E ?




_ _ _ _ _ _




_ _ _ _ _ _

seetê nîşan bidin




seet pênc û nîv




_ _ _ _ _ _

seet didu û çarîk



seet heşt kêm bîst û pênc



www.arsivakurdi.org

## DARA MEZIN Û GAVAN

Dareke mezin li ber deriyê qesra Padîşah şîn hati bû û devê derî teng kiri bû. Qurm û rayê xwe di erdê de kûr belav kiribû,lewra brîna wî pir zor bû.

Padîşah şand dû gelek xizmetkarên xwe, lê kesekî ku karibe darê bibire nebû.

Alîkarên padîşah jê re gotin:

-Kesek weke gavanê me bi qiwet û ehmex tuneye,hebe nebe kes ji wî pêve nikare darê bibire

Padîşah rabû şand dû gavan û jê re got:

-Kuro tu karî vê darê bibirî û min ji werta wê xelas bikî?

-Çawa ez nikarim Padîşahê min,aniha ezê darê bibirim

-Tê bi çi wê bibirî?

-Bi meqes Padîşahê min!

Dema Padîşah ev gotin bihîst,ponijî ku ew tinazê xwe pê dike.Lewra got xulamên xwe"lêdanek pîs li gavan xin û wî ji eyarekî têxin eyarekî din" Xulaman jî gavan nimandin,ji kulm,şemaq û pihînan...

Xulaman ew rakirin şipê û carek din ji Padîşah pirs kirin bê wê çi bikin,Padîşah li ber sekinî û jê pirs kir:

www.arsivakurdi.org

-Tê bi çi...

Gavan carek din got "bi meqes"

Xulaman ji nû de halê wî pîs kirin.

Lê ew ji ya xwe nehat xwar.

Rabûn ew xistin hewdê avê û ew binav kirin,demek bûrî ew dirxistin.Padîşah jê pirsî:

-Bi çi....!

-Bi...me...me...qes.

Dîsa ew binav kirin û ew dernexistin.

Gavan destê xwe ji nav avê bilind kir û cardin tiliyên xwe wek meqes li hev xistin.

D A R Î/Sofîa

1985



## PÊKENÎN

Carekê du kes ji gund derdikevin û diçin dervî gund.Wê gavê seet yekê şevê bûye.Herdû kes li ser girekî rûdinên û dest bi peyvê dikin û dikevin nav xem û xeyalan.

Carekê yek ji wan dibêje:

-De rabe em dîlanê bikin.

-Bila,de em dest pê bikin

Sedema ku wana dest bi dîlanê kir ev bû; tu nabê li bajarê nêzîkî gundê wan dîlanek hebûye,dengê def û zirnê dihat hetanî bi cem wan.

Gava herdû dest bi dîlanê dikin,qutya cixara ya yekî ji wan ji bêrîka wî dikeve. Yê din jî pêlê dike û dipelixîne.Piştî demakê herdû radiwestin(disekinin)û yê ku qutya wî ketiye dibêje:

-Lo pismam,de ka were em hinekî bêhna xwe berdin û cixarakê bikşînin.

Yê din jî dibêje"baş e"

Gava rûdinên xwediyê qutyê destê xwe davêje bêrîka xwe,lê qutya xwe nabîne û dibêje hevalê xwe:

-Ma te qutya min nedîtiye?


-Na bi serê te


Xwediyê qutyê radibe li qutyê digere.Carekê dibîne ku çi bibîne,qutya wî tev pelixiye

Û dibêje hevalê xwe:
-Bi xwedê te qutya min pelixandiye
Hevalê wî lê vedigerîne:
-Hevalo,ez ji ku zanim bê kê qutya te pelixandiye,govend geriya bû,dengê def û zirnê bilind bû,kî zane bê kê qutya te pelixandiye!


RÊNCBER/Bûlgarîstan


1985







4 deh û 5 yek: 45










| | | |
|---|---|---|
| 234<br>307<br>+ 75<br>........ | 705<br>− 317<br>........ | 624<br>− 275<br>........ |
| 74<br>x 7<br>........ | 56<br>x 8<br>........ | 85<br>x 9<br>........ |
| 108<br>x 7<br>........ | 115<br>x 8<br>........ | 107<br>x 9<br>........ |

www.arsivakurdi.org

XAÇEPIRS



SEREJÊR:

1-Tiştekî girêdanê (berepaş)

2-Gotina qebûlkirinê..Behr,heq

3- Rengek (berepaş)

4-Filîz,bişkivîn...bazdan (berepaş)

5-Çaxa yek tiştekî dimije...lez û bez (berepaş)

6-Noteyek...heywanek (berûpaş)

7-Du tîp

www.arsivakurdi.org

8-Tiştê ku li hewa meriv germ dike

9-Navê welatekî

SEREJÊR:

1-Gotina pirsê(berepaş)

2-Xwarê,binî

3-Navê keç an jinekê...Navê mêrekî

4-Tiştekî li xwe kirinê...Berê ji Tirkan re digotin

5-Amo(bankirina apê xwe)..Şikil(berepaş)

6-Tiştekî girêdanê...çav,lênerîn,çavînî(berepaş)

7-Tiştekî germkirinê(berepaş)

8-Di lîstika qelemaçan de kaxezek

Bersiva xaçepirsa hejmara 22 an

| | | | 1. | 2. | 3. | 4. | 5. | 6. | 7. |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1. | | | | A | M | E | D | ■ | S |
| 2. | | | Î | S | A | M | ■ | K | I |
| 3. | | | N | Î | L | O | K | Ê | L |
| 4. | | | S | ■ | ■ | K | ■ | L | Ê |
| 5. | | | A | ■ | R | Ê | T | ■ | M |
| 6. | | | N | ■ | A | ■ | E | R | A |
| 7. | | ■ | ■ | A | Z | A | Z | ■ | N |
| 8. | K | U | R | D | A | Y | E | T | Î |

www.arsivakurdi.org

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS
: 10:- skr
BIHA

www.arsivakurdi.org